

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)



**zarok**

**fêkiyên**

**malan e**

Hevalno!

Newroz nêzik dibe, ez dixwazim cejna we pîroz bikim, hêvîdar im ku hûn kêfxweş bin û rojên xwe bi kêw û şahî derbas bikin. Hêvîdar im ku ev sala nû bibe sala xebatê li dijî rejîmên xwînmij, kevneperest, faşîst û şovenîst.

Hevalno!

Ez di destpêka nama xwe de gelek silavan li we dikim û çavên we radimîsim. Ji bo karê we yê niştimanî û welatparêzî spasîyên xwe pêşkêşî we dikim. Birastî ev karekî pîr delal e, ku hûn kovarekê bi zimanê mîletê me, zimanê 25 milyon Kurdê bindest, derdixin. Ez ji we pîr hêvî dikim ku hûn hejmarên Kulîlkê bigihînin destên min. Ji ber ku em li vir ji alî pirtûk û kovarên Kurdî pîr hejar in. Ger hûn çî ji min bixwazin ez amade me û ger hûn bixwazin ez karîm materiyal jî ji we re birêkim. Ji ber, ku ez dixwazim zimanê Kurdî pêşdetir bibim û alîkariya brader û xwûşkên Kurdî di warê ziman de bikim. Ji aliyê din hin kesên biyanî hene, ku dixwazin zimanê Kurdî hîn bibin.

Hevalno!

Li vê de (li yekîtiya Sowyet) gelek tiştên di warê zarok û dirokê de hene, ger xwestina we hebe ez karîm ji we re bişînim.

Ez cardin silavên germ li we dikim û çavên we radimîsim, Hêvîdar im, ku kesên wek we di nav miletê me de pir bin.

Em jî li vir dixwazin dewra zimanê Kurdî vekin, Kêm kes tîne. Ji ber, ku îmkânên me û materiyalê me kêm in, Lê ev karê me berdewam e.

Bijî kesên welatparêz û niştimanperwer û kesên ku dixwazin mêjû û zimanê miletê xwe bide zanîn.

Bimre kevneperestî û kêşperestî

Zor spas

Hevalê we FEYSEL XELEF (Kurdê Sûrî)

Mosko 1985

Newroz! Rojêke nû, mizgîniya ronahî û dest-  
pêka biharê ye. Newroz, nişana liberxwedana  
gelê Kurd û gelên rohilata navîn ya li dijî  
koledarî, sitemkarî û gerdenxwariyê ye.

21 ê Avdarê dema pîrozkirina cejna New-  
roz ê ye. Ji aliyê din bihara rengîn e. Di  
cejna Newrozê de xelq ji kêf û şahiyê mest  
dibin. Jin û Mêr, keç û xort, Pîr û Kal, zar û  
zêç cilên xwe yên nû li xwe dikin, xwe dixemil-  
lînin û berê xwe didin çiyar û seyrangehan.

Mêr û jin hevdû hembêz dikin, keç û xort bi  
awirên dilketinê li hev dinerin, dilketî hev-  
dû di vê şahiya mezin de dibînin. Zarok ji  
xwer bi lakan, bi gokê, bi çavgirtînkê, bi çirê  
dilîzin. Pîr û kal li hevdû kom dibin, kada  
dem û dewranên berê û kala xortaniya xwe ji  
hev re dikin.

Êdî roja serbestî, roja kêf û şahiyê ye!  
Gelên Kurdistanê vê roja firaz (muqaddes), ro-  
ja biserketin û liberxwedanê pîroz dikin.  
Serê çiyar bi agir û ronahiyê dixemile. Her  
kesek meşalek di destan de ye û pîrozkirina  
cejna Newrozê ji dinê re diyar dike.

Kurdistan di cejna Newrozê de weke bûka nû-  
hatî dixemile. Bihara rengîn çar aliyên Kurdis-  
tanê bi xweşiya xwe dixemilîne.

Newroz sersala me ye  
Adet û ola me ye  
Piçûk û mezinên me  
Dibêjin êdî dem e  
Diçine sersala hev  
Dicivin li mala hev  
Kêf û govendê dikin  
Tevdîr û bendê dikin  
Ji bo ku bi ser xwe bibin  
Dijmin ji ber xwe bibin  
Sersala Kurdan pîroz  
Ew e cejna me NEWROZ

Kadrî Can

Waye cejne jîn û tazekî Newrûz hatewe  
Yezdan geşiyar bi baharmanî bi datewe  
Ser ber her çilê gul bi neyayekî Bilbil e  
Bezmekî cem be pêva şabe her dila

Pîre Merd

x x x x x x x x x x x x x  
x x x x x x x x x x x  
x x x x x x x x x  
x x x x x x x  
x x x x x

Newroza we pîroz be!

www.dawakurdi.org

## KÊZIKA TER Û CAN

Kêzikek ji xwe re li mêrekî digeriya.  
Carekê ew rastî şivanekî hat.Şivan jê  
pirsî:

-Kêzikê,kêzkatûn ê! tu li çi digerî ?

Kêzê lê vegerand:

-Ez li mêrekî digerim

-Baş e,ma tu min nastîni ?

-Belê,çima te nastînim! lê ku te bistî-  
nim tiwê bi çi li min xî ?

-Wele ezê bi çoyê xwe li te xim

-Nebû şivano,nebû.....

Kêzik ji şivan qetya û bi riya xwe de  
meşya.Kêzik rastî Cotkarekî hat.Cotkar jê  
pirsî:

-Kêzikê,kêzkatûn ê! tu li çi digerî?

-Ez li mêrekî digerim

-Ma tu min nakî?

-Belê,te dikim,lê ku te bikim tiwê bi  
çi li min xî ?

-Wele ezê bi misasa xwe li te xim


-Nebû Cotkaro,nebû.....

Kêzê berdewamî riya xwe kir û rastî  
Gavanekî hat.Gavan ji Kêzê pirsî:

-Kêzikê,kêzkatûn ê! tu li van deran çi  
digerî?

-Qet pirs meke Gavano!ez ji xwe re li  
mêrekî digerim





-Te go mêr ? mêr ez im! tu min nastînî?

-Te distînîm, lê ku te bistînîm tiwê bi  
çi li min xî ?

-Ezê bi darê xwe li te xim

-Tu jî nebû Gavano...

Kêzik bi riya xwe de meşiya, Kêzê gelekî  
westiya bû û bêhn lê teng bûbû. Bi rê de  
ew rastî Mişkekî hat. Seydayê Mişk li dora  
Kêzê fitilî, xwe da ber Kêzê û jê pirsî:

-Kêzê Kêzê Kêzaxatûn ê, tu li van deran bi  
tena serê xwe li çi digerî?

-Ma ezê li çi bigerim Mişko! Ez li mêrekî  
digerim.

-Mêrê ku, tu lê digerî ez bi xwe me. Ez jî  
li Xatûnekê mîna te spehî digerim. Gelo tu  
min nastînî ?

-Belê, ez te distînîm. Ger te bistînîm tiwê  
bi çi li min xî ?

-Ez mêr im, mêr! Mêr tucarî li mêya xwe  
naxe. Ez jî li te naxim. Ezê dêla xwe (terya-  
xwe) kil bikim û bidim ber çavên te yên  
reşûbelek.

Kêzê Seydayê Mişk pejirand (qebûl kir)  
dan û dû hev û çûn mala Mişk.

Mişk ji Kêzê re got:

-Kêza min, ji me re îro germiya dew bide  
ser. Lê ku, tu germiyê bidî ser, ji bîr me-  
ke, germiyê bi heskê li hev mexe, bi kevçî  
li hev xe.



Kêzê lê vegerand:

-Dibe Egîdê min

Piştî Mişk ji malê derket û çû derve  
Kêzê bi a xwe kir û germî bi heskê li  
hev da. Ji bo ku, Kêzê baş germiyê li hev  
xe, xwe bi ser beroşê de xwar kir û bi  
xwarkirinê ve Kêzê ket nava germiya ke-  
landî.

Piştî demekê Mişk hate malê. Li Xatûna  
xwe Kêzê gerya lê ew li malê ne dît. Hemû  
derê malê tevda lê ew ne dît. Mişk li ber  
beroşa germiyê rawestî û germî li hev da.  
Çaxa Mişk germî le hev xist dît ku, Kêza  
wî ya spehî û bejinzirav ketiye nav ger-  
miyê û pê re kelya ye. Bi dîtina wê qêrîn  
bi Mişk ket, xwe avêt der û li ber malê  
xwelî(arî) li serê xwe kir.

Carekê siwarek ji dûr ve xuya kir, nêzî-  
kî Mişm bû û jê pirsî:


-Xêr e Mişko, xwelî li ser ?

Mişko bi kelegirî got:

-Mişko xwelî li ser, Kêza ter û can keti-  
ye dîza dan

Siwar ji hespa xwe peya bû û wî jî qûna  
xwe belût(belbelot) kir

Di wê navberê de keça Cotkarekî ji bavê  
xwe re mast û taştê ya wî dibir.



Keçikê çav li wan kir û ji siwar pirsî:

-Siwaro! Çima qûn belût ?

-Siwarê qûn belût, Mişko xweli li ser, Kêza ter û can ketiye diza dan

Keça cotkar mastê xwe bi carekê bi ser serê xwe dakir û qêrîn pê ket.

Bavê keçê bi dengê keça xwe rabû pê, hat ba keça xwe û jê pirsî:

-Çima keça serbimast ?

-Keça serbimast, siwarê qûn belût, Mişko xweli li ser, Kêza ter û can ketiye diza dan.

Cotkar cotê xwe berda û xwe da ser misasa xwe,

Darek li kêleka wan hebû, Darê ji cotkar pirsî:

-Cotkaro! Çima li ser misas ?

-Cotkarê li ser misas, keçika serbimast, siwarê qûn belût, Mişko xweli li ser, Kêzika ter û can ketiye diza dan

Darê ji pelên xwe bi carekê weşandin, Çûkek hat xwe li ser darê danî û jê pirsî:

-Darê! Çima pel weşandî ?

-Dara pel weşandî, cotkarê li ser misas, keçika serbimast, siwarê qûn belût, Mişko xweli li ser Kêzika ter û can ketiye diza dan.

Çûkê ji xwe rûçikand (perpitand) firya û çû xwe li nava garisan danî. Garis ji çûk pirsî:

-Xêr e çûk ê xwe rûçikandî ?

-Çûkê xwe rûçikandî,dara pel weşandî,cotkarê  
li ser misas,keçika serbimast,siwarê qûn be-  
lût,Mişko xwelî li ser,kêzika ter û can keti-  
ye diza dan

Garisan serê xwe xwar kirin. Kaniyek du çavî  
li ser garisan hebû.Kaniyê ji garisan pirsî:

-Çi bû garisên serî xwar ?

-Garisên serî xwar,çûkê xwe rûçikandî,dara  
pel weşandî,cotkarê li ser misas,keçika ser-  
bimast,siwarê qûn belût,Mişko xwelî li ser  
kêzika ter û can ketiye diza dan.

Kanî bi ser garisan de girya,Hêstirên wê bûn  
xwîn û nem,ji çaviyek wê xwîn û ji çaviya din  
jî nem ranewestî(nesekinî)

## KURD DIREQISE

Ha bûye her zeman  
 Ha li her dema  
 Wexma li gerê  
 Govend digere  
 Qûjîna zirnê  
 Radike qurnê  
 Gîzma ringîn e  
 Xemla şingîn e  
 Û ji wî dengî  
 Mêrgêd zeng zengî  
 Çiya,banî,derî  
 Dihejin bi hevre  
 Ji xweş koçerî  
 Wexta toz dûman  
 Radibe giran  
 Tev deşt û beyar  
 Bi sosin û yarê  
 Wexta dinê tam  
 Şerqê heta Şam  
 Digire zende  
 Govend bê bend e  
 Û dengê defê  
 Ji nava kêfê  
 Dighiye geliya  
 Diçe her aliya  
 Êdî napirse  
 Bizanbe eş e

Kurd direqise  
 Ha bûye her zeman  
 Ha li her dema  
 Wexta erd û ezman  
 Bi hevre naz û can  
 Têne govendê  
 Bi gul û rihanê  
 Kaw dixemilînin  
 Ax bêrivanê  
 Wexta mêrg û gelif  
 Bi hevre bê gilî  
 Hûbê dibêjin  
 Wexta lal,dura  
 Ji boy hev dirêjin  
 Li nava govendê  
 Ken dibe çem,bêr  
 Pêl dide her der  
 Şal,qutkê reng-reng  
 Bi hevre eşq û beng  
 Naz dimilmilin  
 Ji hub û şayê  
 Bizanibe e'se  
 Kurd direqise

SIMO Ê ŞEMO



Zarokno!

Bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Li malê bi dê û bavê xwe re bi Kurdî biaxivin. Ji ber ku, meriv bi zimanê xwe û bi welatê xwe tên naskirin.

YAN

KURDISTAN

YAN

NEMAN!



Divê em zanibin ku, çaxa em bê ziman bin û welatê me bindest be, emê timî di nava mirovên cîhanê de stuxwar bin, emê xulamê xelkê û kolê ber devê derya bin.

Ji vê yekê, Zarokno!

Bixwînin, zana bin. Bizanibin ku, hûn jî miletek in. Bizanibin ku, welatê me bindest e, parçeki-rî ye.

Li her cîhî li Kurdîtiya xwe xwedî derkevin, çavên xwe ji kesî re negrin, doza xwe bi erzanî nefroşin.

Ji bîr nekin ku, her bihustek axa welatê me bi xwîna bav û kalên me hatiye avdan. Ji bîr nekin ku, xwîna di rayê me de xwîna Kurdîtiya xas e, ger em vê xwîna xas ji bo welatê xwe nerjînin, dayikên me şîrê xwe li me helal nakin.

Divê em zanibin ku, namûs û şerefa meriv welatê meriv e!

## P Ê K E N Î N

Atatirk bavê kê ye

Rojekê yekî Kurd diçe leşgeriya Tirkan  
da ku, leşgeriyê bike.

Di ser re demek derbas dibe yê Kurd di  
warê leşgeriyê de kone dibe û êdî tirsawî  
weke berê namîne.

Rojekê dengê pîpîkê (duduk) li nava leşger-  
xanê belav dibe, leşger tev ji lez û bezê xwe  
li bin guhê hev dixin û bi halekî kesanedî  
li meydanê kom dibin û dikevin rêzê.

Tevde li benda hatina serleşger dimînin.  
Deng ji kesî dernakeve, çitîni ji derekê nayê.

Piştî qederekê Serleşger hêdî hêdî ber bi wan  
ve hat. Destên wî li pişt qûna wî ye û bi awi-  
rên tûj li leşgeran dinere û carê çavekî xwe  
ber bi jor û yê din jî ber bi jêr vedike, li bejn  
û bala leşgeran dinere û diçe vî serî û seriyê  
din. Ma hedê kê ye ku, karibe çavên xwe bikut-  
kutîne ?

Serleşger hat li ber rêza leşgeran rawestî  
ku, leşgerê Kurd jî di vê rêzê de ye.

Serleşger ji serî dest pê kir û pirsî:

-Kurê min! Ma Atatirk kî ye ?

Leşgerê Tirk

-Atatirk bavê min e qimandanîm!

-Eferim, eferim..

Serleşger ji yê din pirsî:

-Kurê min! Ma tu zanî bê Atatirk kî ye ?

Leşgerê Tirk

-Atatirk bavê min e qimandanimmmmm!

-Eferim, eferim, her bijî!

Serleşger hat li ber leşgerê Kurd rawestî

û jê pirsî:

-Kurê min! Ma Atatirkê mezin kî ye ?

Yê Kurd tiliya xwe ber bi leşgerê Tirk vekir

û got:

-Atatirk bavê hevalê min e qimandanim!

Çavên serleşger wek tasan vebûn, madê wî  
tirs bû û bi dilekî şikestî ji vir veqetya

BRÎNDAR

## KEÇÊN KURDA

Keçên Kurda êdî rabin  
Xorta rêz girt hûn jî wa bin  
Rêçê bigrin ji bona welat  
Rêça welat tevde şa bin  
Xwe azad kin, xwe rizgar kin  
Wek miletan serfiraz bin  
Bê felatî bê serbestî  
Li cîhanê hûn wenda bin

Keçên Kurda êdî rabin  
êdî rabin

Tev bixwînin tev pêşkevin  
Bi pêşketin hûn nakevin  
Lê her li ser şopa durust  
Rêç xwar nebî hûn şaş nabin  
Hûn nîv gewd in ji millet in  
Millet bê we bê himet in  
Di rêça welat bi xurtî herin  
Hûn û xortan her wek hev in

Keçên Kurda êdî rabin  
êdî -abin

Keça Kurda êdî zû rab  
Ji xelkê cîhan tu ma li talî  
Gelkan nebûn pêk anîne  
Hinî firîn çûne banî

Milet şiyar kir welat standin

Rê û nerîn dane zanîn

Êdî rabe keça Kurda

Tu jî carek bid xuyanî

Keçên Kurda êdî rabin

êdî rabin

Ji mezna bigir bide bi çûka

Kora şiyar kin bidin pêşî

Ketî rakin li kera barkin

Weka xortan bikin hûn jî

Herin cengê bi hev girtin

Rexta deynin li şûna teşî

Bêjin"bijî" bêjin" bijî"

Ji bona welat ev xwînêrêjî

Keçên Kurdan êdî rabin

êdî rabin

D U R U S T

/Sûrî/

## MELE Û GUNDÎ

Demekê Melakî gundekî hebû, Ewî digot gundiyan:  
"Ez zanim bixwînim û binivîsînim!" Rebenên gundiyan jî jê bawer dikirin. Wekî em tev zanin di Kurdistanê de rola Melan mezin e û xelk heta derecakê ji wan bawer dikin.

Rojekê yek ji gundiyan diçe mala Mele û dixwaze ku, Mele jê re namekê binivîsîne. Gava ê gundî daxwaza xwe ji Melê re dibêje, Mele lê vedigerîne:

-Wey li ser seran û ser çavan, fermo rûnê.

Yê gundî rûdinê, ji Melê re tiştê ku, dixwaze dibêje. Mele namê dinivîsîne û dide ê gundî. Gava gundî dike ku, biçe mal, berê namê dişîne û paşê diçe mala xwe.

Piştî heyvek (mehek) di navberê derbas dibe, rojekê namek ji ê gundî re tê. Ji ber ku, ê gundî nizane bixwîne, nizane ku, ew nama jê re hatiye nama wî ya ku, Melê nivîsandiye.

Ê gundî berêvarkî zû berê xwe dide mala Melê, li derî dixê û dibêje:

-Seyda, Seyda! roja te xweş be!

Seyda lê vedigerîne

-Tu xweş hatî, fermo ka derdê xwe bêje!

Ê gundî namê pêşê dike û jêr dibê:

-Seyda, name ji mervê min hatiye.



Mele dibê:

-Ezê aniha ji te re bixwînim û bêjim bê çi hatiye nivîsandin.

Gava Mele namê vedike lê ecêbmayî dimîne. Carê diqulpîne vî alî û aliyê din lê dike nake tê nagihiji.

Mele radibe ji ê gundî re dibê:

-Flankes, bavo evan kesan ev name bi çi zimanî nivîsandine, bi gawirî ye, bi ingilîzî ye ? ev nivîsandin dişibe nivîsandina dewrana Eshaba gidi! Wele bi serê te ez tê nagihijim

Rebenê gundî radihiye nama xwe û diçe mal-ka xwe.

Lê a rastîn Melê nizanî bû nivîsandina xwe bixwîne û digot: "Evan kesan ev name bi gawirî nivîsandine.

RÛNCBER

Bûlgarîstan



## NAVROJ

Almastê gazî bavê xwe kir da ku, bê firavînê bixwe,

Bavê wê pirsî:

-Ma îro firavîna me çi ye ?

Almastê lê vegerand:

-Qet tişt tune!

Bavê wê got:

-Madem wisa ye, hûn niha bixwin, tiştê ku, ma ji min re ji bo şîvê bihêlin.

-----

## DÎK Î KEVIREÎ GIRANBIHA

Carekê Dîkekî xwelî vedida. Wî di nava xwelîyê de kevirêkî giranbiha dît î got:

-Ey kevir bi kêrî çi tê, ma ew kesana ne ehmeq in ku, vî kevirî biha dihesibînin ? Ezê şa bûma ku, min li dewşa vî kevirî hinek ceh bidîta. Rast e, ew libên ceh ne biha ne, lê minê zikê xwe têr bikira...

Têmûrê Xelîl Mûradov

Êrîvan


Navê van fêkî û Zerzewatan li hemberî  
 hejmaran binivîsin

- 1.....
- 2.....
- 3.....
- 4.....
- 5.....
- 6.....
- 7.....
- 8.....
- 9.....
- 10.....
- 11.....
- 12.....
- 13.....
- 14.....
- 15.....
- 16.....
- 17.....
- 18.....
- 19.....
- 20.....
- 21.....
- 22.....
- 23.....
- 24.....
- 25.....
- 26.....



Gelo hûn karin hejmaran û navan li hev derxin ?

Cênîk.....Rû.....  
 Çiçîk.....Dest.....  
 Qebd.....Tilî.....  
 Lêv .....Pê-ling...  
 Mil-çeng....Navîk.....  
 Nava dest...Anîşk.....  
 Pêşenîk.....Pêçî.....  
 Serî-ser....Pehnî.....  
 Kêlek,tenişt,.Zik.....  
 Rehn-hêt....Bend.....  
 Kabok.....  
 Por.....  
 Guh.....  
 Poz-bêvil...  
 Zengelolk...  
 Sîng.....  
 Burh,Birû ...  
 Mijank.....  
 Çav.....  
 Gewrî.....  
 Qirik.....  
 Sermil.....  
 Çen.....  
 Pişta stu,patik....  
 Dev.....  
 Anî.....  
 Gûzek-gwîzek...  
 Ling -paq .....  
 Zend .....



Bersivên pêzanînen hejmara 17 an

- 1-Nûrî.(ew dûrbîn e û li pêşiya xwe dihizire.
- 2-Ehmed.(ew jî kibar û bi xirûr e.
- 3-Eyşê.( Ew jî dixwaze zû bizewice û kula  
wê zewac e
- 4-Mihemed.(Ew jî çavbirçî ye û miriyê peran e.

-----

Pêzanîn(2)

Me gotibû xeratê gund(hoste necar) ava hew-  
dik bi seradê biribû kaniya serê çiyê.Rast e.  
Xeratê gund ev kar pêk anî bû û paşê jî qîza  
xwe dabû xeratê gund.

Lê çawa ?

Me gotibû qewlê xerat ji serê payizê heta  
meha Avdarê ye.Di navbera payizê û biharê de  
zivistan heye.Xerat jî li benda zivistanê ma.  
Çaxa bû zivistan dinya cemidî û her cîhî qeşa  
(cemed) girt.Ava di hewdik de jî tev bû qeşa  
xerat ew tertiyên qeşa yê kirin seradê û bir  
kir bîra serê çiyê.Û bi wî awayî qîza paşê  
ji xwe re anî û giha meqsed û miradê xwe.

Bersiva xaçepirsa hejmara 17 an

	1	2	3	4	5	6	7
1	G	U	L	A	Z	E	R
2	U		E		E	R	A
3	L	E	Z	Û	B	E	Z
4	B		G	N	E	H	A
5	I		Î		S		N
6	H	Î	N			Ê	
7	A	R		M	Û	R	Î
8	R	O	J	Î	N		S

Têdayî	rûpel
Zarok fêkiyên malan e . . . . .	.1
Nama xwendevanekî . . . . .	.2
Newroz . . . . .	4
Kêzika ter û can . . . . .	6
Kurd direqise . . . . .	14
Zarokno . . . . .	15
Pêkenîn . . . . .	16
Keçên Kurda . . . . .	18
Mele û gundî . . . . .	20
Navroj-Dîk û kevir . . . . .	23
Navê fêkiyan . . . . .	24
Navê lebatan . . . . .	25
Bersiv . . . . .	26
Bersiv . . . . .	27



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

PRIS : 10:- skr  
BIHA